



# HÊVI

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar:3 Nisan/1981






# HÊVI

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar:1 Sibat/1981

-TÊXISTINÎ-

BÛKA BARANÊ.....	2
ÇÛK Û FÎL.....	4
GURÎYÊ KEVOKVAN.....	7
DESTE KÎ YE LI SER DESTAN.....	11
SALEKÎ DE ÇEND DEMSAL HEYE?.....	12
XAÇERÊK.....	14-15
HELBEST.....	16



## BÛKA BARANÊ

Lı kurdistanê pırê salan bihar bê baran û zıwa derbas dibe. Sala ku baran kêm bıbarê û xweşi derbas bıbe, ew sal debr û ziyan ne baş tene dıdın. Debr hemi hişk dibe. Xelk tıkeve taya xwe û birçibûniyê û xelayê. Çaxa xweşi çend rojan ber bı dom bıke, rengê ziyanan zer dibe û serên wan dı ber wan de dıxele û dıke ve ber wan. Lerz û tırşa xelayê û birçi bûniyê dıkeve nava gundiyan. Ew gav çend pırıkên gund dıkevin nava gund û bana zarokên gundiyan dıkın:

- Heydê zarokno em bûka baranê çêkın....

Zarokên gund tev lehev dıcıvın. Lı çoyeki dirêj kincikên cure-cur girêdın û dıxemlının. Jı wê re dıbên bûka baranê. Zarok wê çoyê xemlandi dıkın nav xwe û hemi dor lê dıgrın û deveki, behev re ban dıkın:

Baranê

Bıbar+bıbar,

Çûçıkan genımên


Te xwar,

Sêwiyan

serên hev xwar.....

Bo berhev kirina bulxur,nan,rûn û xwey çen zarokên mezın her yeki tûrikeki digre. Bûka baranê lı pêşi û hemi zarok ji lı dû lı nava gund mal bı mal digerin.Jı her malê bulxur , rûn,xwey û nan berhev dıkn.

zarok,bûka wana baranê û pırık bı tılılı , bı hawa û bı dua "baranê bıbar bıbar"... ji gund derdıkevın der.Ger ziyareta gund hebe , derın hında ziyaretê, Ger ziyaret tınebe derın şûna bênderên gund an ji derın ciyekı bılın.Zarok hemi bela dıbn.Qırşık,qotık û puşa berhev dıkn.Tının ağır geş dıkn. Ev tıştın ku berhev kirine pırık dıdn ser ağır dıpêjn.Çaxa xwarın lı ser agıre zarok û pırık gış behevre dua baranê dıkn.Dawiyê de hemi behevre xwarınê dıxwın û behevre dua baranê dıbêjn û bela dıbn.



#### ÇUK U FIL

Dîbêjin carê çûkekê, hêlina xwe nêzîki rêya av vexwarîna fileki de çêkırîbû. Hêk û çêlek ji tê de kırîbû. Fil weke hertîm, dî wîr re derbas bu. Jî bo ku her e avê vexwe. Dî ku hê linek tîji hêk û çêlê wa lî ser rêya wî de ye. Çû jî keşti pê lêkır. Hemî kûşt û şikand . û lêxîst çû ser avê.

Gava çûk hat, dî ku ne hêlin heye û ne jî tîştak lî şûnê xuyaye. Çûkê jî xwe ra go: Heye tune ye va sosırata han fil bî. serê mîn de anî ye. Mîheqeq va xırabiya jî fil e. Çûk fırya û çû lî ser serê fil dani. Jê re got: Ya bîrayê fil, te çıra ev ebreta bî serê mîn de anî? Te ez lî darê dînyayê bî tenê hiştîm. Û qaşo em ciranê hev bûn. Û tu xırabiya mîn jî ne gı hiştiye te, heta iro. Te ez bıçûk û reben dî tîm, jî bo vê, te lî mîn wa kır? Fil lê veğerad û got:

- Belê herweki te goti weni ye. J1 bo vê yekê ji min veya ani serê te. Gava ku fil weni peyîvi, çûkê berê xwe jê guherand û fırya. Çû ba koma teyran û giliyê xwe b1 wan kır. Û ser pêhatiya xwe j1 seri heta dawiyê tamam j1 wan re got. Û pêre daxwaz kır ku bên alikariya wê.

- Çûkê go, teyrno hûn b1 min re werin. Em tev biçin ba fil. L1 ser serê wi deynin û wi b1 nıkılınin.

- Teyran, gotina wê rast ditin û hemûya m1 - lên xwe dane hev û çûn l1 ser serê fil danin Û çavê wi dan ber nıkılan. Heta kor kırin û roniyaya wi rijandin.

- Fil bê ronahi, bê xwarin û bê vexwarin ma. Weni d1 cihê xwe de. Dıkır hawar û ore or, j1 ber êşa çavê xwe. Mêş kelmêş û mûriyan girtin ser çavê wi. Nıkıl kırin û dest b1 xwarina wi kırin.

Çûkê disa dev jê ber ne da. Fırya çû ba golek tije beq û j1 wan re j1 ser pêhatiya xwe got.

- Beqan l1 çûkê guhdari kırin. Û pêre lê ve gerandin.

- Hey çûka reben, ma tepa me d1 mezinahiya fil de çiyê? Em d1 karin ç1 b1 fil bıkın? Ne qeweta me l1 fil tê, ne j1 a te.

- Çûkê got: Lê belê ez dixwazim j1 we hın b1 min re bên. Em biçin ba korteke nêziki fil û hûn tê de bıkın qurrre qurr. Gava fil dengê we bibhize (seh bike) wê bawer bike ku ev dengê han j1 erdeki b1 av tê. J1 ber ku pır ti bûye wê xwe l1 dengê we bigre û bê têkeve kortê.



-Beqan daxwaza çûkê qebûl kir û çûn di kor  
tê de êwirin. Û di kortê de kîrîn qurre qurr.

Fil, gava ku dengê beqan bihist, tibûnê hin  
bêtir lê zor kir. Berê xwe da dengê beqa û  
çû. Giha ser lêva kortê ku dike avê vexwe,  
hew dit ku di kortekê wer bû. Kort gelki kûr  
bû û fil nî karibû jê derketa. Pêre çûkê fir  
da xwe û çû li ser serê wi dani. Û jê re got

-Hey filê stûr, tu bî xurti û mezînbûna xwe  
gelek stûr bûbû. Te kesek di ser xwe ra ne di  
dit. Ji ber vê stûriya te, te ji min çûkê qet  
şayiş ne kir. Nuha tu çawa dibine ku, min bî  
vê çûk bûna xwe te xist vê kortê. Tu deng ji  
fil ne hat, ser hev da tepîsi weni mîr û çû.  
Ma di kortê da.




## GURÎYE KEVOKVAN

Na yê helbet. Başê, wê gavê em dîkarin çî bê-  
jîn? Karker dîxebitîn, hemî qezencê Heci Eli  
dîstine. Hew çandî ku nemîrîn jî dîdewan. Ango  
malê Heci Eli ne malê wi ye birakê Gurri. Jî  
te ra jî helal e"

Gurri, bî dîleki rehet dîkeve mala Heci Eli  
yê çawfıraş. Ketiye nav qewraşên jî bexçê der  
va derbas dîbîn, kerî vi ne dîtiye. Heci Eli ,  
bî jîne xwe va lî ser hewîza nav bexçe runîş  
tîbu, nanê esîr dîxwar. Dî sofrê da jî hingiv  
heta to, her cur xwarîn hebû. Lî alîki nan sor  
dîbûn, lî alî dîn jî çay dîkeliya. Av bî devê  
Gurri ket, çu jî her xwarînê parîki jêkîr. He-  
ci Eli nihert ku hingiv jî to jî her ku dîçe  
kem dîbîn, tîrsiya, dest bî dua kîr, rakîr tîz-  
biyê dest bî kîşandîne kîr. Gurri, xwe dîrêjî  
îskema Heci Eli kîr, qurtek jî çaya wî vexwar  
Vê car jî kîrya hemî giriyan û dest bî revê  
kîrîn. Gurri jî xwe lî ber sîfrê pan kîr, heta






ku jê tê xwar. Zikê xwe têr kîr. Piştî ket qo  
 naxê, yek bî yek lî oda geriya. Ji devlemendi-  
 ya ku dit çavê wi wek ferê aş vebûn, devê wi  
 jî hev çû jî ecêbmayî. Her derê qonaxê, bî şam  
 danên zêr û zivin, fîraqen bîriqandi, bî xalî,  
 secade û hîn eşyayên dîn yên jî hev bî rumet  
 tîr hatibû dagirtin. Gurri, çî tîştê ku karibe  
 hilgire, da ser mîlê xwe kîlîte bî dest xîst  
 û jî qasa Hecî Elî hîn pere jî rakîr. Nivê şe  
 vê piştî ku ket mala hîn dewlemendên dîn jî,  
 nêzi sibê reka mala xwe girt. Hînik jî pera

bo xwe veqetand, yê mayi ji li malên feqir yê ser devê rê belakir. Gurri yek bi yek li deriya di xîst ê ku deri lê vekirana ji wan ra wilo digo:

" Ha ji te re vê kulma zêra û vi du hezari bo zarokên xwe mesref bike. Ev para te ye, ji kesi ra ji tu tîştî nebêje."



Kê deri vedıkır,beri ku tê bighê ki diaxafe deng jı ku tê lı binê lingê xwe kulmek zêr û qendek pere dıdit.

Gava sorayiya rojê avêt Gurri vegeyriya mala xwe.Diya wi ya extiyar hê şiyar bû.Lı ber dolabê rûniştıbû û bı meraq lı hevişa lawê xwe bû.Kevok jı serê wan dı bin baskê wan de radızan.Gurri hêfika ket hundır,lı nık diya xwe rûnişt.Paşê,jı nişka ve kumık jı serê xwe derxıst.

Gava jinepirê,lawê xwe lı nık xwe dit, gelek kêfxweş bû:

" Gıdi,lawo,tu lı ku bû heta niha!"

" Ez lı mala Heci Eliyê cawfiroş bûm dayê, hın tıştê ku jı xelkê sitendıbûn paşta dıstend"

Jinepir rabu,çû jı lawê xwe re gırar ani.

Gurri go:


" Dayê mın ew qas to û hingiv xwari ye ku ez hefteki tışteki nexım cardın pırçi na bım"

(dûmahık heyê)

## DESTÊ KÎ YE LI SER DESTAN

Qasi çar-pênc kes zarok tên berhev û hev dijmêrîn. Bist lî ki keve ew dibe "DIYA DAGE" Diya dagê lî navê runî dîke. Çong(çok)û eniş-kên xwe dîde erdê. Serê xwe dîke ber xwe. Çavên xwe jî dîgre. Zarokên dîn dor jî diya dagê dîgrîn. Destên xwe qor bî qor dîdîn serhev û dîdîn ser piştta diya dagê. Hemû destên xwe bîlînd dîkîn û lî piştta diya dagê dîxîn. Bî lêxistîne re jî hemû bî deveki:

E kîr, ne kîr  
Çaran çêkîr.  
Avê rengê,  
Pir qulengê.  
Mastê miyan,  
Lî ser sêniyan.  
Yên ku ne xwîn,  
Guh lî nav rûyan.  
Destê kî ye,  
Lî ser destan?



dîbêjîn û jî diya dagê pîrs dîkîn. Diya dagê bersiv dîde û dîbê "destê fîlankesê ye lî ser destan." Ger diya dagê rast bersiv bîde, destê kî lî diyarên destan be, ew kes îcar dî be diya dagê. Na, ku dernexe destê kiye lî diyarê destan, dîsa diya dagê, diya dagê dimîne û leystîk dom dîke. Heta ku destê diyarê destan derxe. Ev leystîk wer domdîke.

SALEKÎ DE ÇEND DEMSAL HEYE?

Siyabend û Sosin jî sibê ve bi berfê dile yîstîn. Westiyabûn û rûyên wan jî serma sor bûbû. Gava hatin mal jî bavê xwe re gotin;

-Zivistan pîr xweş e. Me dixwest ku herdem zivistan be.

Bavo:

-De werin, defterê xwe de binivsinin.

Buhar hatibû. Siyabend û Sosin bê westan bi hevalên xwe re brê, gogê leyistîn. Qebê girtin û bazdan. Piştî nivro wexta zivirin mal, jî bavê xwe re gotin;

-Buhar çiqas xweş e! Me divê herdem buhar be.

Bavo:

-De werin defterê xwe derxin û di navde bi nivsinin.

Havin hatibû. Zad, ceh û garis zer bûbûn. Cot karan dest bi çinina wan kiribûn. Zebeş, petêx, isot û bacan gihîştibûn.

Siyabend û Sosin alikariya dê û bavê xwe dikirin. Zebeş û petêx dixwarin. Esirki wexta hatin mal, jî bavê xwe re gotin;

-Xwezi herdem havin bûna. Havin pîr xweş e.

Bavo:

-De werin defterê xwe de binivsinin.

Pelên dara tev zer bûbûn. Baran û ba dest pêkırîbû. Her ba dîhat, pelên dara dîweşand. Germa havinê nemabû. Cotkar dest bî cotê xwe kîrîbûn. Çivikên yên demsali hêdi hêdi ber bî nivro ve dîfiriyan. Vebûna dibistanê re hindik ma bû. Siyabend û Sosin jî vebûna dibistanê pîkêfxweşbûn. Jî bavê xwe re gotin;

-Payiz demsaleki pîr xweş e.

Bavo:

Erê weki we ye. Çar demsal jî xweşin. Lê jî bir mekî ku, payiz bî xwe re zivistanê jî tine. Welatê me de xîzan pîr in. Jî dijwariya zivistanê nexweşin pîr dibin. Bîrçibûn destpêdike. Gundi tevde berê xwe didin bajêr û kar digerin. Lê disa jî defterê xwe binin û binivsinin. Çar navên demsal bî hev re xwendin.

ZIVISTAN

BUHAR

HAVÎN

PAYÎZ

De werin em jî bî hev re navên demsala bî nivsinin.

1-B . . A .

2- . A . . Z

3-Z . V . S . . N

4- . A . Î .

Geli hevalên hêja !

Em jî yekê heta reqema mezîn, bî xêzîka hemû  
reqeman bişhinin hev. Ew çax wêneki pîr xweş  
û delal wê çê be. De werin em bihev re çêkin.







DIYA TE

Tu zarokeki qasi lep ki bú,  
kê şir dıda te?  
tu nexwe ket, dıkıra bımra,  
kê per bı ser tera girt?

Serê teyi bıçûk  
dıkır nav kefa destê xwe,  
şevan, bê xew dıma  
dı hımêza xwe da kê tu hêjand?  
tu gırya, ki bı tera gırya?  
DIYA TE !

kê cara yekem gav bı te avêtın da?  
kê tu hini axaftınê kır, yek bı yek?  
DIYA TE!

Nuha dema tu diçi dibıstanê  
ki xuriniya te hazır dıke?  
ki lı pê te dınêre?  
heqê kê, hin pır lı te heye?  
kiye hin bêtır, jı te hez dıke?  
DIYA TE!

N.Hikmet-1950-

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)



H E V I :

ADRESS:

---

Kovara Kurdi ya zarokan  
Kurdish children magazine  
Kurdisk barn tidning

Hêvi / BOX 5034 16305  
Spånga/SWEDEN  
Postgiro,439 33 42-3

PRIS:3 kronor / ~~SUBSCRIPTION ABONE:30 kronor per år~~